xûyên jîyankirinê, û nêzîkatîya mirov a li hev û ankû nerîna mirov a li hev jî wê weke aliyekê wê yê ku mirov bi wê re wê li wê bihizirê. Li ser wê temenê de wê dem wê weke demek bi aqil bi rohani wê were dîtîn û wê ber vê yekê wê weke dema ronekbiriyê û hwd jî wê were dîtîn û salixkirin. Mijare dema ronakbiriyê di aslê xwe de wê pêwîst bê ku ew bi serê xwe wê, weke mijarek teybet wê hilde li dest. Di wê temenê de wê, li ser wê re dikarê wê werênê ser iman ku wê ronakbirî wê hinekî wê bi temenekê rasyonali û zanyarî û hwd re wê pêşkeve. Pêvajoyên felsefeyê ku wê berhevkirinek bîrî û xêvî wê biafirênin wê di wê temenê de wê di jîyane mirov de wl, bina temen û bingihê şoreşên bi fahmkirinê û rengên cihê ên fahmkirinê. Wê weke encama hûmanisma aqil û felsefeyê ku wê piştî ronansê û pê de wê pêşkeve jî wê, dikarê şîrovebikê û wê werênê ser ziman. Wekî din wê, dema ronakbiriyê wê, bi temenê hemû pîrsgirêkên civakê li ser temenekê aqilane ku ew bînan hildan li dest û werina fahmkirin jî bê. Wê weke pêvajoyek giring a encama aqilê rasyonali a ku wê di jîyanê de pêşkeve dikarê bibîne û wê werênê ser ziman. Di wê rengê de wê pêvajoyên felsefeyê wê bi wê re wê, biqûlibina li felsefeya zanyariyê û aqil jî wê bi ber aqilê zanyari ve wê, di wê demê de wê êdî wê **pêşkeve**,

Mirov wê bi encamên aqilê xwe re jî êdî wê bijî. Ev wê hem ji aliyê pêşxistinên bi çêkerî ên weke bi tenikê û hwd bê û hem jî wê ji aliyê din ve jî wê weke rewşên bi nivîsandinê û pêşxistinên rewşên nû ên weke bi nivîsandin û bi derhanên ji hev re wê ew wê bikê. Mînaq bi reng û şîroveyek din nivîsandina destanekê, romanekê, hizrek weke ku ew di derbarê têgînek mîtolojikî, bûyerek jîyanî û hwd de bê wê di wê temenê de wê bibê. Di wê temenê de wê, şêwayên weke yên çêkeriyên weke binivîsandinên weke 'sûrrealist' ku wê werina bi navkirin û yên weke realist wê werina bi navkirin wê di wê temenê de wê werina pêşxistin. Sûrrealism wê weke têgînek ku wê rastiyê wê bi şîroveyên weke têgînên ser rastiyê re wê, şîrovebikê û wê werênê ser ziman bê. Ev wê, bi çêkirina wêneyekê, nivîsandina romanekê bi afsûnê û hwd wê karibê bibê. Wê weke dervî çerçoveya hişê realist û ankû asayî wê, were dîtîn û wê di wê temenê de wê were ser ziman. Lê di awayekê de wê, çendî ku wê, bi wê rengê wê werê ser ziman jî wê bi nerînek rasyonali wê bi çerçoveya wê hevgirtinîya wê bi fahmkirinê û têkiliya wê ya bi temenekê realist bi jîyane mirov a xwezayî re wê bê danîn re wê, ew wê bê kirin. Di wê çerçoveya rasyonali de wê sûrrealism wê weke tefsir û ankû şîroveyek bi xêzkiriinê, nivîsandinê a li kes û rewşên jîyanî û hwd re wê

karibê bimênê. Sûrrealism wê di renekê de wê, di çerçoveya afrînerîya mirov a bi xiyal de wê, weke mijarekê fahmkirin, şîrove û tefsirê wê bimênê. Di dewama wê de wê weke aliyekê wê yê giirng wê di serî de wê, dikarê wê fahmbikê û wê werênê ser ziman ku wê, ji rewşekê bi xiyal derhanîna rewşekê bi şewayekê felsefeyî jî wê dikarê wê, di çerçoveya şewayê şîrovekirina wê ya jîyanî de wê fahmbikê.

Piştî pêşketina tégînên weke bi hûnerî û hwd di nava jîyane hemdem de wê ev wê di reng û şewayekê de wê pêşkevin û wê derkevina li holê. Di wê temenê de wê şîroveyên wê di nava hûnerê, wêjeyê, ramyariyê, helbestê, şano, wênekişandin, filmçêkerî, û hwd re ku wê, weke van bi gelek aliyên din re jî wê karibê werê hanîn li ser ziman bê. Di aslê xwe de wê sûrrealism wê ji aliyekê ve wê di tégihê de wê nîşanaka serwerîya mirov a bi aqilê mirov a li rewşan bi fahmkirinê re jî wê bi xwe re wê bide dîyarkirin. Sûrrealism wê, di wê temenê de wê, di temenekê de wê, hinekî jî wê, dîmenên weke yên bi xewnê, xêvî û hwd jî wê, di renekê de wê çawa wê bi dîmen bikê û wê bi rewşên jîyanî û hwd re wê têkiliyek bi felsefeyî û hişmendî wê bi re wê biafirênê jî.

Di mijare fahmkirinê de wê, di demên hemdem de wê ji gelek aliyên ve wê, xwediyê awayên giring ên dîrokî ên ku em bi çerçoveya pêşketinê wê werênina ser ziman bê. Di wê temenê de wê, di demên hemdem de wê, felsefeyên demên kevnera wê, çawa wê bi temen û nerînek rasyonal wê jinûve wê bîn şîrovekirin bi minaqên wê re dikarê wê werênê ser ziman. Destpêka wê şewayê jinûve şîrovekirinê wê di demên ronansê de wê, bi pêşxistinê weke bi çerçoveya tégîna 'platonvanên nû' û hwd re wê di renekê de wê weke ku mirov dikarê wê werênê ser ziman wê bibê. Wê di wê rengê de wê, şîroveyên teolojikî wê, li ser temenekê civaknasî û hwd wê, berê xwe ji tégînên *wahiyî* wê bidina bi ber jîyanê û aqilê wê ve.

Wê, mijarên jîyanî wê ji xwe re wê bikina mijarên fahmkirinê. Di dewama wê de wê mijarên fahmkirinê ên demên hemdem wê bi rengê sazûmanîya bi fahmkirinê û di dewama wê de bi wê jîyankirinê û hwd re wê, xwe di renekê de wê, bide dîyarkirin. Ev wê di şewayekê de wê, ji rewşên bi pirsgirêk ên ku mirov dijî bi nêzîkatîya li wan û heta rengên baweriyê û awayên bi rengê hildana wan a li dest û hwd re wê di renekê de wê xwe bi wê re wê bide dîyarkirin.

Têkiliya tégîna rasyonalismê û ya demên hemdem wê di serî de wê bi gotinî wê têkiliyek morfolojikî wê bi wan re wê hebê. Wê di wê temenê de wê, ev têkilî wê dema ku wê ew wê were hanîn li ser ziman jî wê bibê. Wê dema ku wê tégîna rasyonalismê di demên hemdem de û ankû di

hemdemî di çerçoveya têngîna rasyonalismê de wê li wê were lê hizirkirin wê di dewama wê de wê bi hevdû salixkiran wê bi wê re wê were kiran. Ev dikeve nava zimanê mirov ê rojane de jî.

Minaq wê dema ku mirov wê bahsa kirinekê wê bikê wê bi gotinên weke 'di vê dema aqil a hemdem de kirinek bi vi rengî' û ankû 'di vê dema hemdem ku wê bi aqil pêşkeve de wê, kiranên bi wê rengê wê ne rast bin' û hwd re wê, ew wê bê hanîn li ser ziman. Di wê rengê de wê, têkiliyek li ser asta pêşketinê a bi aqil ku wê di demê de wê bibê re wê bê hanîn li ser ziman. Gotinên bi wê rengê wê tiştêkê din jî wê bi xwe re wê bênina ser ziman û wê bidina dîyarkirin. Ew jî wê di temenê de bê ku wê, dem wê bi aqil re wê, pêşkeve û wê di bin serkêşîya aqil û zanînê de wê pêvajoyên demê ên jîyankirin wê bin jîyankirin.

Di mijara rasyonalismê de wê, di wê rengê de wê, di serî de wê bi temenekê aqilî û zanînê re wê, bi çerçoveyekê wê were ser ziman. Lê di dewama wê de wê jî mirov dikarê werênê ser ziman ku wê, rasyonalism wê weke astek bi zanînê a ghiştinê û pîvane wê ya ku mirov li gorî wê dijî wê di rengekê de wê bê dîtin û zanîn. Di aslê xwe de wê, mijare zanînê wê di wê rengê de wê, bi têngîna rasyonalismê re wê, di serî de wê, werênê ser ziman.

Her çendî ku wê demên hemdem bi gotinê û rengê pêşketina wê re li ser gotina aqil, zanîn û ankû rasyonalismê re wê bi astek ku ew bi wê pêşdikeve re wê werênê ser ziman wê, di dewama wê de mirov divê ku rasyonalismê jî di temenê wê de wê weke astek bi zanînê ku wê di nava wê de wê bi wê were jîyankirin wê dikarê wê fahmbikê û wê werênê ser ziman. Ev wê, di serî de wê weke aliyekê wê yê giring bê ku mirov wê di serî de wê di temenekê kirdeyî a bi fahmkirin û pêşketinê re wê di dewama wê de wê bi wê re wê werênê ser ziman bê. Di mijara fahmkirina aqil di demên hemdem de wê, di çerçoveyek rasyonalî de wê bibê. Wê weke ku wê di rengekê de wê Habermas jî wê ji aliyekê ve wê, dema ku ew gotina 'hemdemiyê' wê weke 'proyeyek ne bi temembûyî' ku wê werênê ser ziman wê, di wê temenê de wê, li ser wê rengê re wê, dikarê wê gotinê jî bi reng û awayekê bi kirpênê.

Di wê temenê de wê pêvajoyên pêşketinê ên di demên hemdem de wê, ji aliyekê ve wê, bi aqil û pêvajoyên pêşketinê ên aqil ve girêdayî bin. Wê di wê temenê de wê hertimî wê ghiştina zêdetirî zanîna objektîv û li ser wê re li pêvajoyên xwe yên jîyanê nerîn û di dewama wê de wê aqilê darazî jî wê di çerçoveyek rasyonal re wê, bi çerçoveyek weke ku wê bê



gotin 'li ser temenê xwe rûniştî' û bi temen wê di renekê de wê bê fahmkirin.

Di întîbaya bi gotina têngîna aqilê darazî de wê, destpêkê de wê, hîsiyetek irrasyonel wê xwe di mejiyê mirov de wê bi wê re wê bide dîyarkirin. Ev wê dema ku wê bi têngînên weke bi civaknasî û derûniyê û hwd re wê, bê ser ziman wê li ser bertek û rewşên weke ne asayî û ku mirov weke ne ahenge jîyanê de dide nîşandin re wê, di renekê de wê were ser ziman. Di aslê xwe de wê, di wê temenê de wê, di kirinên mirov de wê, mirov wê, di wê rewşê de wê, bi hewirdorê re levkirin wê, ji aliyekê ve wê, di wê çerçoveyê de wê, were fahmkirin. Hinekî jî wê di wê rengê de wê ji gotina rasyonelîzmê û rengê aqiliya wê ya di wê temenê de wê têngîhiştinek ahengî, levkirî, bi sedem û encamê dikarê were dîtin û fahmkirin û hwd re wê, were ser ziman.

Mirovê dema hemdem wê di wê temenê de wê weke mirov bi zane, di derbarê kiryar û kirinên xwe de ku ew xwedî zane bê, bi hiş bê, li xwe û kirinên xwe bi hiş û şiyar bê û serwer bê. Wê di wê rengê de wê, li xwe serwerbûn wê, di wê temenê de wê, gelek caran wê bi gotina zanîne û bi zanîne bi serwerîya wê re wê werê hanîn li ser ziman. Rasyonelîzm wê di wê temenê de wê biqasî bi zanînbûn wê di dewama wê de wê di wê temenê de wê, bi wê serwerîyê ku mirov karibê aqilê xwe bikarbêne jî bê. Wê di wê temenê de wê, di reng û awayekê de wê karibê wê fahmbikê û wê werênê ser ziman.

Aliyekê din jî wê li ser wê hebûna zanîne û bi aqilbûnê re ku mirov wê dikarê wê werênê ser ziman wê bi wînbûn û bi wê re ku mirov weke ku wê bê gotin ku mirov bi serê xwe û zanîbê ku wê çî bê û çawa bikê. Di wê çerçoveyê de wê, li ser wê temenê re wê, di renekê de wê, di dema kifşkirina zanîne wê li şûna li gorî têngînek baweriyî û hwd ku wê bi başî û nebaşiyên wê re wê, tevbigerihe wê, di nava jîyanê de wê, di cihê xwe de û di nava rewşê de wê kifşbikê ku wê çî û çawa wê rasttir bê. Wê di wê rengê de wê, di awayekê de ku wê bi aqil weke ku wê were gotin tevbigerihe.

Di wê rengê de wê, dema ku mirov wê bi xwe wê were şîrovekirin wê bi têngîna 'objektiviya mirovî' wê bi wê re wê, bi temenekê fahmkirinê re wê were ser ziman. Ji wê objektiviya mirovî wê çî di wê temenê de wê karibê bi wê were fahmkirin? Wê di serî de wê ew wê were fahmkirin ku mirov wê, di renekê de wê, li ser temenekê sedem û encamê weke ku wê bê hevîkirin û rast dîtin ew tevbigerihe. Di kirinên xwe de wê, di serî de wê, weke carna kurd di nava xwe di civatên xwe de dibêjin ku wê, 'pêşî û

başıya gotina xwe zanîbê û wê bênê ser ziman.’ Ji wê gotinê çî dihê fahmkirin? Ew di serî de dihê fahmkirin ku mirov di kirinên xwe de wê, bi temenekê li wê dihizirê de ku wê kêm zêde pêşbibînê ku wê çî encam wê derkeve li hemberî mirov.

Keseyeta rasyonel re jî wê, di wê temenê de wê ji wê rengê pêşketina keseyetê re wê were gotin. Di wê temenê de wê, weke keseyeta ku ew li kirinên xwe dihizirê û dikê. Kirinên weke ‘nerast’ ku wê werina dîtî nekê. Di wê rengê de wê hinekî jî wê çerçoveya rasyoneliteya mirovî wê bi derûniya girseya giştî re wê, awayekê de wê weke ku wê xwe bide dîyarkirin. Di wê temenê de wê, li gorî wê, di nava koma giştî de wê bi wê re di levkirin û ahenge de bûyîn wê di serî de wê çawa wê di rengekê de wê weke ku wê, tevbigirihê. Weke xûyên gelemper ên ku ew di nava komê de dihên nîşandin bide nîşandin. Ev wê, di serî de wê weke aliyekê wê yê giring ê din bê ku mirov wê di dewama wê de wê bi wê re wê li wê bihizirê bê. Di mijara rasyonelismê de wê, di serî de wê, bi aqilbûn û di çerçoveya kirinên xwe de bi aliyên wê yê hundirîn û derveyî ku ew xwediyê çerçoveyek fahmkirinê bê. Wê bi wê re wê çawa wê, bi wê re wê, bide nîşandin ku ew wê zanîbê. Kirin di her awayê de wê, dema ku mirov wê dide nîşandin wê di rengekê de wê weke ku mirov wê dikarê wê fahmbikê ku wê weke di nava jîyanê de wê ji gelek aliyan ve wê karibê têkilîyên xwe yê bi hiş û ankû bendên bi hiş bi hewirdorê û kesên ku ew li wê dinerin, dibînin û hwd re wê çêbikê. Di nava nerînekê de wê, her tişta ku ew di çerçoveya wê de di wê kêlikê de hat dîtî wê weke beşek ji wê dîmenê ku ew dihê dîtî wê were dîtî û hasibandin. Em dikarin di wê temenê de wê mînaqê kişandina wêneyekê bidina nîşandin. Di wêneyekê de wê dema ku mirov wê dikişênê wê di wê de wê tişt û kesên cûr bi cûr wê karibin werina dîtî. Her yek ji wan wê bi serê xwe wê di aslê xwe de wê xwediyê rewşek fahmkirinê bê. Wê karibê weke objeyekê û hwd were salixkirin. Lê ew di çerçoveya cihgirtina di wê dîmenê wê wêneyê û hwd de wê weke aliyekê wê yê din ê girng wê karibê xwe bide dîyarkirin bê.

Ew wêna wê weke wêneyekê ku ew heya û dîmenê hundûrê wê hebê, piştî ku ew hat kişandin. Çerçoveya wê karibê weke çerçoveyek di çerçoveya xwe de jî wê weke çerçoveyek rasyoneli karibê were hizirkirin. Lê di rastiyê de wê rasyoneli ne tenê di çerçoveya xwe de wê hebê, wê di serî de wê di çerçoveya levkirina di ahenge jîyanê û jîyankirîna û hwd de wê bi temenekê rastin wê hebê.

Di demên hemdem de wê dema ku mirov wê bahsa têkiliyên mirovan bi hevdû û xwezayê re wê bikê wê ev alî wê di çerçoveyekê de jî wê bi wê re wê, di nava wê de wê karibin werina dîtin û fahmkirin. Wê li ser wê temenê wê, di rengekê de wê fahmbikê û wê derxê li têgihiştinê. Mirov wê, dema ku wê di nava jîyane xwe de wê çawa kirinek da nîşandin wê ew weke mejuyek wê kesê a ku ew bi wê kirinê re dayî nîşandin bê. Di wê temenê de wê, carna wê bi têgînek bijartî mirov wê bêjê ku 'ez naxwezim ku ev kirin di jîyane min de bê kirin' û hwd. Wê di wê temenê de wê mirov wê li ser wê re wê di mejiyê xwe de wê weke ku wê xwediyê perspektifekê bê ku wê çawa wê bijî û wê kirinan wê bikê û wê kirina bixwezê ku ew jêre werin dayîn nîşandin.

Di temenek rasyonal de wê mirov wê weke kirdeyekê di hizirê wê, were ser ziman. Di dewama wê de wê weke kirdeyek dihizirê û dikarê kifşbikê ku ew çi bikê û çi nekê. Di dewama wê de wê, kirina ku ew kir wê, berpîrsîyarîya wê hilde ser milê xwe. Mirov di wê temenê de wê, dema ku tiştêk bi başî û nebaşî kir wê, li ser wê kiriniya bi wê û wê re wê, weke aîdîyetek wê biafirê. Ev aîdîyet wê, temenê wê têgîna berpîrsîyarîyê a mirov a ji wê jî wê biafirênê. Di wê temenê de wê, di demên kevn de wê weke ku mirov di nava Zerdestîyan de li kurdistanê dibînê wê, tiştên weke hişbir û ankû hişê mirov ji xwe dibê wê, bèn qadaxakirin. Ber ku mirov wê di wê temenê de wê çawa wê weke zindiyek dihizirê û bihiş heya wê, bi wê rengê ew di farqe wê de bê ku ew çi dikê û çawa dikê. Rewşên ku mirov ji wê dûr dikin dixwezin bi wê li dijî wan bin. Ev wê, weke aliyekê wê yê din ê giring bê ku mirov wê di dewama wê de wê weke aliyekê têgînê ê bi çerçoveya fahmkirina rasyonalismê re jî wê di rengekê de wê werênê ser ziman bê.

Di demên hemdem de wê, dema ku wê bahsa awayê pêşketina wê were kirin wê di dîmen û rengekê de wê bahsa têgîna 'gîyane demê' wê bi wê re wê, were kirin. Ji vê gotina 'gîyane demê' mirov çi dikarê wê fahmbikê? Di serî de wê, di dewama şîroveyên me yên di vê beşê ên di çerçoveya rasyonalisma demên hemdem de wê, dikarê bêjê ku wê awayekê pêşketinê, bi rengê wê, derûniya wê, rengê civaknasiya wê ku wê li ser awayên wê yên têkili û pêşveçûnên bi keseyetiyê û hwd re wê hebê wê, bi wê re dikarê werênê ser ziman. Di mijare hemdemiyê de wê, wê, dema ku wê bahsa wê were kirin wê weke mirov wê weke mirovê bi aqil û rasyonal dihizirê û kirinên xwe bi rasyonalî dide nîşandin û dîyarkirin wê, were ser ziman. Di wê temenê de wê, di nava gotina rasyonalism û hemdemiyê de wê têkiliyek bi fahmkirinê a di wê temenê

de jî wê bi hev re wê di şêwayekê de wê bi wê re wê were dîtin. Gotina 'dema zanînê' 'mirovê bi zane', 'mirovê bi aqil' û hwd wê, di wê temenê de wê bi temenekê wê karibin werina fahmkirin û bête hanîn li ser ziman. Di aslê xwe de wê, pêjna mirovê hemdem weke mirovek bi zane û rasyonel a ku mirov wê bi wê bihizirê wê di wê temenê de wê bi morfolojikî wê zanîn wê weke temenekê objektîv û gotina rasyonelîzmê wê weke rengê wê yê levkirî ê bi temenekê *şenber û objektîv* ku wê bi wê were wê were lêhizirkirin re wê were ser ziman.

Mirov wê li ser wê temenê wê weke kirdeyek bi zanînê xwe têrdikê wê hertimî wê derkeve li pêş. Ber vê yekê wê azwerîya hê zêdetirî bi zanebûn bûn wê di wê temenê de wê temenê zêdetirî bi hewldana xwe gihandina zanînê, bi zanebûnê û zêdetirî bi fahmbûnê û hwd re wê xwe bide dîyarkirin. Ber ku wê têtikiliya zanînê wê bi kirina 'rast' re wê di temenekê de wê bê danîn. Di dewama wê de wê gotinên weke 'mirovê bi zane şaşan nakê' û ankû 'mirovê bi zane nakevê xelatîyên mazin de' û hwd wê di wê temenê de wê li ser wê rengê hizirkirinê re wê, di rengê de wê bê gotin û wê were hanîn li ser ziman.

Di nava têtikiliya zanînê û rastkirinê de wê weke nûqtetek ku wê di wê de wê li rasyonelîzmê di awayekê de wê were lêgerîn jî bê. Wê ber vê yekê wê, di wê temenê de wê, her çendî wê bi zanebûn wê, weke zêdetirî rastî dîtin, rastkirin û kêmtir kirinên nebaş û ne rastkirin û hwd re wê bi wê re wê were ser ziman. Di dewama wê de wê weke aliyekê wê yê din ê giring wê xwe bide dîyarkirin.

Di wê temenê de wê, rasyonelîzm û aqil wê, di rengê de wê weke di awayekê de du rengên fahmkirinê wê xwe di wê dîmenê de wê bidina dîyarkirin. Di dewama wê de wê dikarê wê werênê ser ziman ku wê mijare rastîyê wê di wê temenê de wê di reng û awayekê de wê bi wê re wê, derkeve li pêş. Rasyonelîzm wê, di wê çerçoveyê de wê, weke şêwayekê fahmkirinê di wê şeklê de wê pêşkeve.

Di çerçoveya têtîgîna zanînê û rasyonelîzmê de wê têtikiliyê jî wê mirov dikarê wê bi gotinekê wê bête ser ziman ku wê her zanîn wê, di awayekê de wê nikaribê bi çerçoveyek rasyonelî were fahmkirin. Ber ku wê di wê mînaq wê zanîn û rengên hizirkirinê ên demên mîtolojîyan û hwd jî wê hebê û ew jî bi zanînê wê dikarê wê werênê ser ziman. Ku em bi gotinekê wê empatîyê bi wê re dênin û wê bêjin ku wê di çerçoveya levkirîniya xwe de wê xwedîyê rasyonelîzma xwe ya di xwe de bê. Lê wê wekî din wê di jîyanê û bi levkirina di jîyanê de re wê, nikaribê xwedîyê awayekê rasyonelî fahmkirinê bê.

Ji vê têtîne ya ku wê di serî de wê were fahmkirin wê di asta pêşî de wê ew bê ku wê bi awayê sazûmana fahmkirinê a bi rengê jîyanê û hwd re ku wê were dîtîn re wê, karibê wê fahmbikê bê. Wê, di nava jîyanê de wê, dema ku em bi aqil bi têtînek rasyonali wê fahmbikin wê di serî de wê, bi têtînek serxwezayî ji wê zêdetirî wê bi têtînek xwezayî wê weke şubjeyek bi fahmkirina ji jîyanê bê. Wê di wê rengê de wê çavkaniya wê hebûn û pêvajoyên pêşketinê û jîyankirinê ên di nava jîyanê de bin. Ber vê yekê wê rasyonali wê bi aqiliya xwe wê xwediyê temen û çerçoveyek şenber a fahmkirinê a di nava jîyanê de bê. Bi gotinek din wê aqilê rasyonali wê weke aqilê ji jîyanê bê.

Di mijare fahmkirina têtîna rasyonali d inava rengê pêşketina jîyane demên hemdem de wê, di wê temenê de wê, weke aliyekê giring ê bi dîtbarî wê xwe di nava wê de wê bide dîyarkirin. Sazûmana bi fahmkirinê wê di wê temenê de wê xwe bi wê re wê di regekê de bide dîyarkirin. Mirov wê, di wê çerçoveya wê sazûmanê de wê, bibîne û fahmbikê.

Hi pêvajoyên wê yên bi fahmkirinê ku wê pêşkevin wê dema ku mirov li dîroka wê dinerê wê, bi wê re wê, were dîtîn ku wê, çawa wê hin bi hin wê bi mirov re wê çerçoveyek têr bi fahmkirinê wê çêbikê. Her dem û pêvajoyên wê yên pêşketinê wê li ser yên din re wê bibê. Ev wê, ne di wê rengê de bê ku wê, tenê çavkani û rengên pêşketina wê ji xwe re wê bide temen de bê. Ji wê zêdetirî wê, dema ku mirov wê pêvajoyên pêşketinê em şîrove dikin û em dibêjin her dem ji ya ku wê piştî wê re wê were bê temen em ne tenê di wê rengê û awayê de wê dibêjin. Di serî de wê, di awayekê de wê dema ku em pêvajoyên peresendinê ên li ser zanînê û pêşketina wê ya bi demê re wê dinerin wê di serî de wê, di her demê de wê, bi astek ku ew dibê wê bibê. Weke ku wê di demên hemdem de wê bibê dikarê ji şewayên pêşketinê ên serdemên navîn sûdwergerê û ankû dikarê xwe di temenekê weke di dîmenekê weke 'biserê xwe' de ku ew xwe pêşbixê jî wê, dîsa wê ev têtîna me wê bo wê bûhûrîner bê. Em wê dikarin li ser pêvajoyên bi ber mirovbûnê ên ji demên homonîdan ku wê heta demên me wê bibê wê, her dem wê bi wê rengê wê li ser temenê xwe wê bibê. Minaq wê, çendî ku em dikarin di nava jîyanê de wê, di regekê de wê weke her zindiyê di temenekê qatagorikî de wê di regekê de wê bibîne û fahmbikê wê di regekê din de jî wê di şewayekê de wê bi pêvajoyên peresendinê û pêvajoyên gûhartinê ku wê bijî wê bi wê re wê karibê bê hanîn li ser ziman.

Minaq wê ji jinek homo sapiens wê mirovekê dema wê newê dînyayê. Yan jî vajî wê ji mirovek jin a roja me wê homo sapiensek wê newê dînyayê. Ev di şêwa û dîmenekê li ser pêvajouyên peresendinê re ku mirov wê karibê bînekê ser ziman bê. Li ser tîgîna cûrebûnê a bi zindiyarî re wê dikarê wê bi heman rengê wê werênê ser ziman. Wê dema ku em di wê temenê de wê, li ser dembûna zindiyekê re wê, gotinê dibêjin wê weke ku wê di dîmen û awayekê de wê weke aliyekê wê yê ku mirov wê li ser çerçoveyek rasyonel re wê dibêjê wê, di wê rengê de wê, werênê ser ziman jî bê. Ber ku wê rasyonelîzm wê di wê temenê de wê bi tîgînî wê di rengê de wê, şewayekê fahmkirinê ê ku mirov wê, dikarê wê weke rengê bi fahmkirina tîgîna rasyonelî wê di fahmbikê.

Di wê rengê de wê, dema ku em dibêjin wê homo sapiensek wê mirovekê roja me wê newê dînyayê wê weke çerçoveyek xwezayî a ku wê bi wê re wê li ser wê herikina bi pêvajoya bûnê re ku wê fahmdikê bê. Wê di wê rengê de wê, dema ku em bahsa wê bikin û em bêjin ku wê, mirovek homo sapiens ji mirovek roja me bû wê, weke tiştêkê irrasyonel ku ez wê werênîma ser ziman wê li her kesekê wê were. Di dewama wê de wê, dema ku ez bêjim ku weke çêlik ji şêrekê xezelak bû û ankû ji meh ji çêlekekê bû wê di wê temenê de wê di rengê de wê weke ku wê tiştêkê irrasyonel wê were ser ziman bê.

Di wê temenê de wê, di çerçoveya tîgîna rasyonelbûn û irrasyonelbûnê de wê, mijare fîzîkê û bi fîzîkê di nava jîyanê de fahmkirin jî wê di wê rengê de wê, di nava wê de wê, xwe di rengê de wê bibê. Li ser wê temenê de wê, laş nikaribê bibê gîyan û gîyan nikaribê bibê laş û hwd jî wê, di wê temenê de wê, bi wê re wê karibê wê bi wê re wê were lê hizirkirin.

Di temenekê rasyonelî de wê, mijarê hizirkirinê wê weke aliyekê wê yê girîng wê dikarê wê werênê ser ziman ku ev temenê çerçoveya rasyonelî wê di wê temenê de wê weke aliyekê wê yê girîng wê xwe di dewama wê de wê bide dîyarkirin.

Mijare rasyonelîzmê wê di nava felsefeyê de wê, li ser wê temenê de wê hewldana bi gihiştina temenekê baş ê fahmkirinê û hwd re wê li wê were lê hizirkirin. Wê dema ku wê, li ser nerîn, dîtin û hwd re wê, li wê bi obje û şubjeyê re wê li wê were lê hizirkirin wê di wê dîmenê jîyanî ê ku ew di nava xwezayê de heya wê çawa wê rasttîr ew bi wê were fahmkirin wê bi wê re wê di rengê de wê, bi wê were lê hizirkirin. Di nava lêgerîna mirov de wê, ev wê, hertimî wê bi aqil re wê, weke lêgerînek bê navber ku wê bê domandin wê bibê.

Ya baştir bigihiştina wê ne tenê wê bi têngîna nerînê û fahmkirina re wê bê. Wê, bi wê re wê, di şewayê fahmkirinê ê element û fenomenên hizrî de jî wê bi wê re bê. Di aslê xwe de wê dema ku mirov pêvajoyên fahmkirina bi rasyonalmê li wê dihizirê wê bi wê re wê çawa wê, dema ku wê, tiştê wê bi aqil wê were çêkirin, pêşxistin û ankû bi levkirin û hwd wê, di wê çerçoveyê de wê bi rêgezekê wê bibê. Pêşxistinên bi teknikî wê, di wê rengê de wê, dikarê werênê ser ziman, weke encamna aqil.

Lê em wê dikarin bêjin ku wê mijare afrînerîya bi aqil wê, weke çerçoveyek ku wê bi tékiliya hizirkirinê a bi obje û şubjeyê, hebûn û biriqîna wê, rasyonel û irrasyoneli û hwd ku wê çawa wê, di dîmenekê de wê, bi wê re wê were dîtin wê, di wê temenê de wê, karibê bi wê re wê li wê bihizirê. Ya rasyonel jî wê li hemberî wê pêvajoya afrînerîya bi aqil re wê diîmenekê dîtbar de wê bimênê û wê tabîî pêvajoyên vegûharînê ên bi herikîna jîyanê û çêkirin û çêkeriyên di nava wê de.

Di wê rewşê de wê mijara rasyonalmê wê, di wê rengê de wê, dema ku em wê fahmdikin wê di wê rengê de wê, di serî de wê, weke ku me li jor hanî ser ziman wê nikarê wê di temen û çerçoveyek teqez û negûhar de wê fahmbikê. Wê di wê temenê de wê, dema ku em wê bi wê rengê wê fahmbikin wê, di serî de wê, rewşa rasyonalmê wê, di renekê de wê, weke ku wê bi şewayê wê yê fahmkirinê re wê weke ku ew nehatibê fahmkirin bê. Ya ku wê li me rasyonel wê were wê hertimî wê ji wê derbasbûn ku wê bibê wê weke ji me re irrasyonel wê were. Lê ew wê dema ku ew bû, bi darêjk û pêşket û pêkhat û pê de wê, bi têngîna û renekê fahmkirina rasyonel wê êdî wê karibê were hanîn li ser ziman.

Di aslê xwe de wê weke van aliyan wê gelek aliyên hizirî û pîretikî ên jîyanî ku wê di wê temenê de wê karibin werina şîrovekirin û fahmkirin wê hebin. Ev jî wê bidina nîşandin ku mijare rasyonalmê wê di fahmkiirînê de wê, weke têngînek bingihînî a ku mirov wê di gelek reng û awayen de wê li wê bihizirê û wê werênê ser ziman bê.

Di rewşa fahmkirina mijare rasyonalmê de wê, çawa wê di temenekê baştirin de wê were fahmkirin wê, di wê rengê de wê, heta roja me wê gelek şîroveyên ku wê bi wê re wê li ser qadên hizir ên ên weke civaknasiyê, felsefe, derûnî, dîrok, dad, ramyarî û hwd re wê, di wê temenê de wê, weke aliyekê wê yê giirng bê ku mirov wê, di wê temenê de wê, fahmbikê û wê derxê li holê bê. Di wê temenê de wê, pêvajoyên bi fahmkirinê ên rasyonelizekirinê wê ji demên berî ronansê ên ji demên kevnera û heta seredemên navîn wê di awayekê de wê weke

mijarek bi hizirkirina felsefeyê bê. Di wê temenê de wê tişt wê çawa wê bi sedem û encamê were fahmkirin wê çawa wê bê bi hêncetkirin û hwd wê di wê temenê de wê bi wê re wê were lê hizirkirin.

### **Rasyonalism û emprisism**

Lê wê mirov dikarê wê di dewama wê de wê, werênê ser ziman ku wê, rasyonalism wê, çendî ku wê weke li ser têtînan weke bi baweriyên, rewîstê û hwd de wê, bi hewldanên dixwe de fahmkirinê weke şêwayekê bi fahmkirinê a di çerçoveya têtîna rasyonali de wê were pêşxistin jî lê wê, pêvajoyên hizirkirinê wê bi wê re wê bidina nîşandin ku ev wê, di nava jîyanê de wê çawa wê bê temenê statûqû û rewşên bi zêhnî ku wê temenê pîrsgirêkên civakî û serdestiyê û hwd ku wê bina sedema ji dest girtina maf û azadi û jîyan mirov jî. Ber vê yekê wê ev mijar wê weke mijarna zêde giring ên bi aqil û fahmkirinê ku wê di xesesîyetek jîyanî de wê, di wê çerçoveyê de wê bînan hildan li dest û di awayekê de her demê rasyonalismê di demên hemdem de ku wê çendî ku wê pê de wê herê wê hizirên ku wê berê hatina ser ziman wê di ber nerînan rexnegir ên rasyonali û hwd de wê bînan derbaskirin wê ev jî wê weke aliyekê wê yê din bê ku mirov wê fahmbikê û wê werênê ser ziman bê. Di wê çerçoveyê de ku em bahsa têtîna rexnegirî bi çerçoveyek rasyonali bikin wê, ji aliyekê ve mirov wê karibê rengê hizirkirina zaneyên wekke Karl Popper jî binavbikê. Popper wê, bînan ser ziman ku wê dema ku wê têtînek ji ya ku ew dihê zanînan ku ew ji wê derkeve wê, dîsa wê bi mantiqî wê bi derfet bê ku mirov wê bi mantiqî wê salixbikê. Li ser wê temenê ku wê bi rengekê wê ji hev gihîştina têtînan zanînan bi epistemolojîkî wê bi wê re wê bihizirê. Wê di temenekê empirîkî de jî wê bi derfet bê ku mirov li wê têtînan bi rengekê bihizirê bê. Li gorî wê ya ku wê bi rêgezî wê fahmbikê wê ew bê ku 'mirov wê nîbi mantiqî nikaribê fahmbikê wê, demê wê bi serê xwe weke çerçoveyek mantiqî de hewlbide ku wê fahmbikê.' Bi wê têtînan mantiqî wê Popper wê li wê bihizirê û wê bixwezê ku wê werênê ser ziman ku wê dema ku wê mantiqê me yê ku em bi wê dihizirin ku em nikaribin rewş û tiştêkê wê salixbikin wê, demê wê tiştê bi xwe weke bi çerçoveyek mantiqî wê fahmbikê. Wê weke şêwayekê pêdeçûyinê a bi zanînan didît û di wê temenê de wê, di wê çerçoveyê de wê bi wê çawa wê bê gihîştin li şêwayên fahmkirinê ên nû wê bi wê re wê bixwezê ku ew bi wê re li wê bihizirê û wê werênê ser ziman. Popper di xabate xwe ya bi navê "*The Logic of Scientific Discovery*" ku wê di sale 1959 nivîsênê de wê, bi wê



re wê bixwezê ku wê têngîna xwe bi temenek zanyarî çerçoveya wê werênê ser ziman. Di xabate xwe de wê, li ser mijare salixkirin û hewldana gihiştina darêjka wê bi kifşkirina wê re wê, bi şêwayekê metodolojikî wê bixwezê ku ew bi wê bihizirê. Di xabate de wê, wê têngîna bi şêwaya 'rêgeza piştrastkirinê' ku wê di temenê zanistê de wê bixwezê wê werênê ser ziman wê bê sedema nîqaşên cihê.

Minaq felsefevan **Bryan Magee** rexneyên Popper ên li ser pozîtîwîzma mentiqî wek "binerazî" bi navkir. Bi dîtina wî, argumana herî girîng a Popper li dijî pozîtîwîzma mentiqî ev bû ku dema wî îdîa dikir ku teoriyek zanistî ya cîhanê heya, rêgeza wê ya navendî, rêgeza verastkirinê, bi bandûr encamek neyînî daya çêkirin. Li ser wê temenê wê rexneyên xwe li teoriya popper bigirê.

Di aslê xwe de wê şêwayên hizirkirinê wê di wê temenê de wê, di her demê de wê bi awayekê mafdar û rastînî wê di ber rexnegirîya rasyonalîzma jîyanî û hwd de wê bîn derbaskirin. Ev wê, di rengekê de wê weke xosletekê pêşketina mirov a bi aqilê mirov ku wê di temen û çerçoveya pêvajoyên pêşketinê mirov ên bi hizirkirinê de ku wê xwe bide dîyarkirin jî bê. Di wê warê de wê, weke ku em di demên hemdem de dibînin wê rewşên weke dibistan bo xwendinê, nexweşxane bo dermankirin û başkirinê û hwd ku wê pêşkevin jî wê ji aliyekê ve wê, weke encama wê pêvajoya pêşketinê û aqilê wê jî bin. Lê wê di dewama wê de wê weke ku em bi hizrên zane û filosofên demên hemdem re dibînin wê li ser temenekê şêwa û rengê pêşketinê û hwd re jî wê bîn di berçav de derbaskirin.

Ji xwe ev di berçav de derbaskirin wê ji aliyekê ve wê weke xosletekê pêşketin û pêşxistinê ê bi hizir jî bê. Di dewama wê de wê dikarê wê werênê ser ziman ku wê, têngîna gûmanê a rasyonalî, û rexnegiriyê a li ser şêwayên fahmkirînê û hwd re wê, di temenekê baş de wê weke aliyna ku em di çerçoveya têngîna aqilê rasyonal de fahmbikin wê, weke nebê nabê bin.

Her pêşketin ku wê bibê wê bi gelek awayan wê were pêşxistin, di berçav de derbaskirin û salixkirin. Wê di dewama wê de wê, ji wê encamên nû wê were derxistin. Di çerçoveyek aqilî a felsefeyî de wê dema ku ew bi çerçoveyekê û hwd re ew hat ser ziman wê, ew êdî wê li wir wê bi dawî nebê. Wê dema ku em, minaq li rewşên weke yên xwandinê ên bi pirtûkî û hwd binerîn wê, di her demê de wê ew heman pirtûk xwandinê wan wê karibin bibina temenê hizirkirinê cihê û nû di serê mirov de. Di wê rengê de wê, encamek ku wê li wê wer gihiştin di

demekê de wê, di demên piştê wê, karibê ew bibê temenê gelek encamên din ên ku mirov bi teybetê xwe bigihênê li wan jî bê.

Her nivîsandin wê çendî ku wê di temenê nivîsandiniya xwe de wê weke di rengekê 'mayinda' de wê, dîmenekê wê bi xwe re wê bide dîyarkirin jî lê wê bi aheng û têkiliya wê bi nerîna me re wê di xwediyê temen û awayekê dîtbar ê afrîner jî bê. Wê li ser wê re wê, di rengekê de wê, di awayekê de wê, bi wê rew wê, çerçoveyek fahmkirinê wê bi têgîna dîtbariyê re wê, werênê ser ziman.

Ber vê yekê wê, di rengê rasyonalisma fahmkirinê de wê, gotinên weke bi teqezî, sermedî û hwd hanîna wan a ser ziman wê, di serî de wê, mirov nikaribê di dîmenekê de li gorî wê werênê ser ziman. Gûharîn di nerîn û fahmkirinê de wê, weke xoslstekê rasyonalisma fahmkirinê a bi temenekê dîtbar ku mirov wê fahmbikê jî bê. Di wê rengê de wê, li ser temenê zanîn û bikarhanîna wê re wê, ji aliyê zindîbûn û hebûna mirov a dihizirê ve ku mirov li wê dihizirê wê, di wê rengê de wê, dîmenekê zêde berfireh a rasyonalisma dîtbar wê xwe bi wê re wê bide dîyarkirin.

Wê demê em rewşên weke bi gotinên ku wê bi navê rasyonalismê ên weke bi gotinên weke 'ew zanîne ji bûyîne dibîne' wan çawa dikarê wê fahmbikê? Di aslê xwe de wê, di wê rengê de wê, ev encama rasyonalismek ji jîyanê qût a bi zêhnî ku ew bi wê dihê hizirkirin wê dikarê wê werênê ser ziman. Ji xwe wê, hemû pirsgirêk di nava fahmkirinê û mirov de wê, di jîyanê de wê ji wê temenê dûrbûna ji zanîna jîyanî jî bê.

Di wê rengê de wê, mirov dikarê wê weke aliyekê wê yê din jî wê di dewama wê de wê, werênê ser ziman ku wê, di demên hemdem de wê, weke mijarek zêde ku wê temenê pevçûnên civakî û zêhnî jî wê biafirênê wê di rengekê bi 'zihniyeta engizisyonê' a serdemên navîn ku wê xwe bide dîyarkirin jî wê li ser wê temen û awayê wê xwe bide dîyarkirin bê. Di wê rengê de wê rasyonalizekirina bi zanîne re wê, di wê temenê de wê di nava jîyanê de wê, xwe di hemû waran de wê, piştî serdemên kevnera û pê de wê bide dîyarkirin. Wê rewşên olî, rewîstî û hwd jî wê di wê temenê de wê, xwe bidina dîyarkirin. Di şîroveyên bi rewîstî wê, bi hewldana gihiştina rewîstek mirovî ku wê çawa wê, bi wê were jîyankirin wê, di wê rengê de wê li ser wê bê sekin in. Di nava rengê hizirkirina wê de wê, rewşên weke yê salixkirina rolên zayendî, spartekên mirov ên li hemberî hev û sazîyên civakî û hwd wê bi wê re wê, li ser wan wê bê hizirkirin. Rewîst kant a li ser spartekên jîyanî ku ew bi wê dihizirê wê, di wê temenê de wê ji aliyên hizirkirinên wî ve wê karibê bê salixkirin.

Di nava kirina mirov, temenê fahmkirinê, wîn û mafûazadî û hwd wê, bi wê re wê li ser wê temenê wê bi temen û tênginek rasyonêlî wê bi wê were lê hizirkirin. Wê dema ku mirov wê bahsa mirov wê were kirin wê li ser wê temenê çawa wê were lê hizirkirin û mirov wê çawa wê bi xwe û xwediye wîn û têngihîştina hebûna xwe ya kesî û hwd bê wê li ser wê temenê wê bi wê re wê were lê hizirkirin. Her têngînên weke yên ol, rewîst, ramiyarî, civaknasî, derûnî û hwd wê, xwediye regekê salixkirinê ên li ser keseyetê re bê. Di demên hemdem de wê, bi pêşketina wê re derketina li pêş a jîyane mirov bi keseyetîya mirov re wê weke encamake encama pêşketina aqilê mirov jî bê.

Di beşa rasyonalizekirina bi fahmkirinê re ku me li jor hanî ser ziman em hinekî li ser wê sekin in. Lê li vir di dewama mijarê de wê mijara zanînê û hwd jî wê weke aliyekê wê yê din wê dikarê wê di regekê de wê, bi wê re wê li wê bihizirê.

Pîştî Descartes wê, di felsefeya demên hemdem de wê, di şewayekê de wê, têngîna gûman û lêpîrsînê wê di regekê de wê, bi wê re wê, derkeve li pêş. Ev jî wê weke rêyek gihiştina zanîna biewlatir jî wê were dîtîn û wê bi wê rew wê li wê were lêhizirkirin. Minaq wê piştî Descartes wê, filosofên îskoçî Hume wê di wê bi têngîna gûman û lêpîrsînê re wê dema ku wê hizrên xwe de wê werênê ser ziman wê, aliyên weke li ser çavkaniya zanînê dihênê ser ziman wê, weke çerçoveya hizra wî ya bi 'emprikî' ku ew bi wê dihizirê jî wê were ser ziman.

Hume wê, di serî de wê, di şîroveyên xwe de wê mijara civaknasîya mirov wê, bi temenekê wê weke çavkanî wê li ser wê sekinê û wê werênê ser ziman. Di rewşên dîyarkirina kirin û çalakiyan de wê, ew wê balê bikişênê li ser temenê hêstî û wê bi wê re wê, bi berdeyamî wê bihizirê. Di temenê deerxistina li pêş a aliyê hêstîyarî re wê, di wê temenê de wê, weke aliyekê wê yê din ku ew bi wê dihizirê û wê, bi wê re wê, werênê ser ziman bê. Di felsefeya hume de wê, di nava têngîna xwezayî û ya çêker de wê, aliyên weke yên bi sîyanên xwezayî re ku wê werina ser ziman wê, weke aliyekê roterikî û bi berdeyamî ê dîyarker di çalakiyên mirov de wê bibînê û wê werênê ser ziman.

Di wê temenê de wê, di aslê xwe de wê, dema ku mirov wê, felsefeya hume dixwênê wê dibînê ku ew di awayekê de wê weke li dijî ya kevneşop wê di regekê de wê bisekinê. Wê minaq wê, minaq aqilmeşandinê wê, di dema hebûna dîyarîya bi aqil de wê, kêmbimênê û wê bi wê re wê, aliyên weke alîkar ên bo aqil weke hêst, hês, û hwd wê serî li wan jî wê bide. Hume wê çendî ku wê bi temenekê wê, bi hizrên

descartes re wê temenê xwe yê felsefî ê rasyonal wê di rengekê de wê çêbikê jî lê wê di awayekê de wê weke ku mirov dibînê ew tenê aqılmeşandinê wê ne têr û kêmbînê. Hume wê, argûmana weke ya pirranîya filosof û zaneyên demê ku wan hanîya ser ziman weke bi aqılmeşandinê mirov wê ji xwezayê dûrkeve wê, di wê temenê de wê, li wê bihizirê û wê, di wê temenê de wê, li ser wê têngîna dûrketinê re wê, li dijî wê têngîna rasyonalisma aqılmeşandinê û bi aqıl gihiştina encamê wê li dijî wê bisekinê. Wekî din wê hinek aliyên hizirkirina wî ku wê bi têngîn û gotinên weke 'metaetikê, empatî, şempatiyê û hwd wê were ser ziman wê, di wê rengê de wê, weke aliyna bi felsefeya wî ya zêhnê û ya rewîstî re jî wê were ser ziman bin.

Di wê çerçoveyê de wê, di sê xalan de mirov dikarê hizrên Hume bi rêgezî fahmbikê û werênê ser ziman. Ya pêş wê ew bê ku wê, cihêyîyên rewîstî ku wê çawa çalakîyên mirov karibê bi bandûr bikê bê. Tenê bi serê xwe aqıl wê, çalakîyên mirov nikaribê bi bandûr bikê bê. Li ser wê temenê wê, cihêkirinên rewîstî wê tenê bi serê xwe ne encama aqıl bin. Li ser gotina 'cihêyîya rewîstî' re wê, di wê rengê de wê, çalakîyên mirov û qarakter û hwd wê, bi wê re wê şîrove bikê û wê werênê ser ziman.

Di dewama wê de wê dema ku wê li ser têngînên weke sedemê wê bihizirê wê bi heman rengê wê, bi şewayekê wê werênê ser ziman. Li gorî wî sedem nîşandar a û yan jî di rewşek mihtemeli de heya. Sedema nîşanakî tenê bi serê xwe wê nikaribê wîne bi bandûr bikê. Sedemê mihtemel jî wê, tenê bi serê nikaribê wîne bi bandûr bikê. Li ser wê temenê wê encama ku ew bigihijêyî ku tenê bi serê xwe aqıl wê nikaribê bandûrê li wîna mirov bikê bê. Li ser wê temenê wê, di awayekê de wê li ser argûmana aqilê razber re jî wê, dema ku ew dihizirê wê, bête ser ziman ku wê, bi temenekê darazî wê bi wê re wê bihizirê û wê li ser têngîna wîne re wê bihizirê û wê bête ser ziman ku 'wî ji têngînên razber zêdetirî wê, li hebûna fizîkî wê xwediyê rewşek motiveyî bê û wê li ser wê re wê, bibê xwediyê temenekê bi bandûrî. Di wê çerçoveyê de wê, giraniyê bide rewşên bi darazî ku wê di mijara ber çî wê zêde carna nebê temen û sedema kirinên pîretîkî. Aqılmeşandin li gorî wê, xwediyê temenekê azmûnî ê bi sedem û encamê bê. Derkên xwe bi wê bête ser ziman. Di dewama wê de wê bête ser ziman ku wê weke sedem darazên me bi rêya azmûnên me encamên fizîkî ên ku ew derdikevina li holê hevgeritiniya wan jî wê di xwe de wê bihawênê.

Hume wê bi wê temenê wê li ser temenekê sedem û encamê wê giringiyê wê bide hoyandin û motivasyonê a di hebûnê de. Wê her kirin

wê, di temenekê de jî wê çawa wê ji aliyekê din ve bi rewşek weke bi têrbûna hêstî, xwestekî û hazî û hwd re wê bê dîtî wê ji wê aliyê ve jî wê xwediyê temenekê fahmkirinê bê. Minaq wê dema ku ez fêkiyekê bixwûm ku ez, bi wê bawer bim ku ew fêzî ji aliyê tendûrûstî ve wê li min baş were wê motivasyona min li wê bikê. Li ser wê temenê de wê, hume di argûmana xwe de wê serî li 'sedema baweriyê' wê bixê. Wê bi wê re wê, di temenekê hoyandinî ku wê çawa wê bi awayekê li wê motivebûyîn wê bibê û wê mirov wê bi wê re wê bikeve rewşekê de wê, li wê bihizirê.

Ew li ser wê temenê wê, rewşa bi mantiqî û dermantiqî wê bi wê bihizirê û wê werênê ser ziman ku wê, ya ku wê li me weke dermantiqî wê were wê yan ew xwestek û haz wê li ser temenekê şaş bê û yan jî wê haz û xwestekê ku ew bo gihiştina ancama xwe wê rêyek encamî a şaş bi me daya bijartin û hwd bê. Li ser wê temenê hume wê bahsa hêza zêhnê û ya wî wê bikê û wê li gorî wê, di wê temenê de wê, ev wê, xwe di rewşa li xwestek û hêsên xwe serwer bê û li şûna wan yên asayî ku ew bi hiş ku ew bibê xwediyê wê re wê bikê ku ew werênê ser ziman.

Hume li ser têngîna vegûhara aqilî wê di dewama wê de wê bihizirê û wê di wê rengê de wê, bînenê ser ziman ku wê, bûjenek aqilî dikarî bi awayekê rast û ankû nerast were nirxandin. Ew nirxandinên weke bi rast û nerastiyê wê, di temenê xwe de wê xwediyê levkirinek têtikiliyî bin. Li ser wê temenê û sedemê wê, ti bûjenî aqilî wê nebin ku wê, tabî têtikiliya rastiyê nebin û bi wê re wê newina ser ziman bin. Li ser wê çerçoveyê wê, hazên mirovî û çalakiyên wê, wê zêde ti têtikiliyê wê ne dîyar bin. Li gorî wê Hume dihizirê ku wê aqil çalakiyê na afirênê, ber ku wê, bûjenê wê nebin.

Li ser wê temenê wê dema ku wê hume wê li ser têngînek rewîstî re wê bihizirê wê bînenê ser ziman ku wê, dema ku wê, ku rewîst di rewşa cihêkirina ya baş û nebaşiyê ji hev de ku ew nexwediyê wê bê wê demê wê, qapasiteyek ku mirov wê, di wê temenê de wê, bînenê ser ziman wê hebê. Li ser wê temenê cihêkirinê rewîstî wê, encama nerînekê bin. Li ser wê temenê wê, dema ku ew wê dihê ser ziman wê, ji hev cihê kirina rewşên weke bi sîyanî û bêrewîstiyê wê bi rewîstî wê bi rê û saya zewk û êşê bê, ne tenê encama aqil bi serê xwe bê. Di wê temenê de wê, weke argûmanak rewîstî wê hume wê, têngîna *hîskirinê* wê derxê li pêş. Ew dema ku wê temenê hîsî wê dihênê ser ziman wê bi minaqe weke zewka ku mirov ji şarabêkê dihilde û ya ku mirov ji şopandina qarakterê kesekê wê ji ya tiştêkê ne zindî wê cihê bê re wê bînenê ser ziman. Li ser wê

temenê wê dema ku ew bahsa rasyonalisma rewîstî dikê wê bi têngîna 'dana berhevdu a hizran' re wê, ew bixwezê ku wê di rengekê de wê werênê ser ziman.

Di têngîna xwe ya sîyanê de wê Hume wê weke ku wê çavkaniya wî spinoza bê. Lê wê, di rewşa hizirkirinê de wê, gûmanbarîya descartes bê. Ew di temenê xwezayî ê çalakiyan de ew li fêrs û nirxekê digerihe û ew dixwezê temenê xwe yê bi hanina ser ziman a di wê warê de bi wê werênê ser ziman. Weke têngînek din ku wê ji wê aliyê ve wê di temenê teroîya wî ya rewîstî de wê cih bigirê wê, nirxandinên rewîstî û derkkirina bi sehî bê. Wê li gorî wê bi wê çerçoveyê wê weke ku wê çawa ku wê sehên me yên fîzîkî weke çekirina bêhnê, tahmê, bihîstinê, dîtîne û hwd û weke azmûnên destlêdanê û hwd re wê, sîyan û bêrewîstîyan jî wê di nerîna mirov de wê bi derfet bê ku ew wê bi wê rengê hîskirina wê bikê. Di wê temenê de wê, dema ku mirov wê li ser têngîna hume re wê bihizirê wê bi wê re wê were dîtîna ku wê were dîtîna wê bi çalakiyê wê aliyekê wê yê hizrî ku ew wê di temenê wê yê objektîv û ankû zanîna objektîv de wê bi wê hebê û aliyê din jî wê li ser wê re wê bi ya hîskirin û hwd re ku wê xwe bide dîyarkirin bê. Ew wê, di wê temenê de wê, aliyê hîskirinê wê weke aliyekê bi bandûr û cih bi cih bi dîyarker wê dibîne û wê dixwezê wê li ser wê bisekinê.

Hume wê, weke hemû filosofên din wê di wê temenê de wê, van hizrên xwe wê bi temenekê bi hewldan û armanca gihiştina 'ya xwezayê jîyanê' û ankû 'ya xwezaya mirov di jîyanê de' bê. Di temenekê rewîstî de wê, dema ku wê, hume wê li ser têngîna xwe ya rewîstî re wê, rewşa razibûn û razînebûnê wê li wê bihizirê wê, bi ya xwestekê û hwd re wê bi wê re wê li wê bihizirê. Di şewayekê de wê, derxistinên bi encamî ên kes re wê di ahengekê de wê, ew wê xwe werênê ser ziman. Di dewama wê de wê hume wê li ser rewîstê û nirxandinên wê ku wê ber çî wê bi hêstên me yên wê kêlîkê re wê levnekin wê bixwezê ku wê jî fahmbikê û li ser wê bisekinê. Ev wê di çerçoveyekê de wê, dema ku mirov wê levnekinê wê werênê ser ziman wê, di gotinek levker de jî wê di dîmenê giştî de wê çawa wê bixwezê wê fahmbikê.

Di mijare têngîna rewîstî de wê, wê bi temenekê fahmkirinê wê di felsefeya hume de wê, têngînen weke yên sempatiyê wê navendek giring wê bileyizin. Di wê çerçoveyê de wê, dema ku wê hizrên xwe wê bêne ser ziman wê bi mînaq emeliyetkirina kesekê ku wê çawa wê, berî wê emeliyetkirinê wê êşek mazin wê bide mirov wê bi têngîna zêhnî ku mirov wê bi tîkiliyek azmûnî ku wê fahmbikê re wê bêne ser ziman. Di wê

temenê de wê sempati wê bi temenê fahmkirina hêstên kesên din ên dervî xwe re wê, weyn bileyizê. Di wê temenê de wê, di nava têkiliya hîskirin û weke çavdêriyekê wê fahmkirin û ankû hanîna li ser ziman wê li wê bihizirê. Di dewama wê de mirov dikarê wê werênê ser ziman ku wê Hume wê, di mijara hizirkirinên xwe yên li ser derkkirinê de wê mijare xiyalkirinê ku wê çawa bi wê têkiliyên hizrî wê biafirênê wê bi wê li wê bihizirê. Ev çerçoveya zêhnî ku wê çawa wê, xwe dûbare û dûbar dihilberênin wê bi wê re wê, weke hêzek nazik di wê çerçoveyê de wê bênê ser ziman.

Di wê rewşê de wê weyna xiyalkirinê wê di nava aqil de wê, bi çêkirina têkiliyên hizrî û aqilî re wê, li wê bihizirê û wê werênê ser ziman. Li ser wê temenê hume balê dikişênê li ser hêsta hizrî û çavdêriyên keseyetî ku wê çawa wê têkiliyekê wê bi hev re wê biafirênin. Ew têkiliya sempatikê wê wek e' rêgezek mirovatîyê wê ji aliyekê ve wê, pênasedikê û wê, dixwezê wê werênê ser ziman. Di rewşek baş û ankû nebaş de wê çawa wê hêstên mirov wê biafirin û wê mirov wê bikina dewrê de wê, di dîmenekê bi fahmkirinê wê li wê bihizirê û wê, di wê çerçoveyê de wê bixwezê ku ew wê werênê ser ziman. Ew di dewama wê de wê, hêsta dadê û sîyanî jî wê li ser temenekê xwezayî û çêkerî re wê werênê ser ziman. Di wê temenê de wê gotina sîyanên çêker re wê, di regekê de wê, şewayên hizirkirinê û pêvajoyên meyên jînkirî ên berê ku wê di wê temenê de wê li wan wê were hizirkirin wê bînerê û wê li ser wê temenê re wê bixwezê ku ew wê bi çerçoveyek fahmkirinê wê werênê ser ziman.

